



Research Article

International Journal of Kurdish Studies
11 (1), pp. 368-398
<http://www.ijoks.com>

Munacatname di Edebiyata Klasîk da û Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî

Önder BEYTER¹ 

Received: Feb 3, 2025

Accepted: Mar 13, 2025

Kurte

Munacat, dia û lavakirin e û herweha wekî têgiheke edebî jî munacat, ew helbest e ku bi dia û lavakariyê efû û alîkariya Xwedê teleb dike. Di edebiyata klasîk da munacat hem wekî beşeke destpêkê ya berhemana û hem jî wekî berhemên serbixwe tîn nivîsîn. Heger berhemeke serbixwe be, wê gavê jê ra munacatname tê gotin. Munacatname jî bi gelemperî bi teşeya mesnewiyê tîn nivîsîn ku ev jî wekî cure dibin mesnewiyên dînî. Di edebiyata klasîk a rojhilatê da û herwesa di edebiyata klasîk a Kurdî da bêtir şairên mutesewif bi vê cureyê va berhem dane. Di vê gotarê da hewl hatiye dayîn ku munacat û teşeya munacatnameyê bi kurtî bê pênasekirin, cihê wê di edebiyata klasîk da bê destnîşankirin û herweha Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî ji bo camieya zanistê bê nasandin. Lewra bi qasî vekolîna me pêk anî, li seheya Tirkiyeyê di qada edebiyata klasîk a Kurdî da heta niha tu munacatname nehatine tesbîtîkirin û nasandin. Ji lewma jî ev gotar di wê îdiayê da ye ku dê vê valahiyê bi gaveke destpêkê va dagire. Anku heta munacatnameyê berî vê bê tesbîtîkirin, Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî yekem munacatnameya serbixwe ya bi Kurmancî ye. Herweha di vê xebatê da tewsîf û tehlîla munacatnameya navborî hatiye kirin û xalên tesbîtîkirî di encamê da hatine destnîşankirin..

Bêjeyên Sereke: Edebiyata Kurdî ya klasîk, munacat, munacatname, Mela Ehmedê Heyderî, Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî

Recommended citation:

Beyter, Ö. (2025). Munacatname di Edebiyata Klasîk da û Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 368-398, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1632118>

¹Ph.D. Candidate of Kurdish Language and Literature, University of Bingol, Türkiye,
e-mail: beyter1990@hotmail.com ORCID: <https://orcid.org/0009-0002-4859-3004>

Munajatnameh in the Classical Literature and the Munajatnameh of Mela Ehmedê Heyderî**Abstract**

Munajat means prayer and supplication; as a literary concept, munajat is poetry that involves asking for forgiveness and help from God through prayer and supplication. In classical literature, munajat are written both as a part of the introduction of works and as an independent work. If it is an independent work, it is called a munajatnameh. The munajatnamehs are also generally written in the masnawi form, and they are considered as religious masnawi in terms of genre. In classical Eastern literature, as well as in classical Kurdish literature, many Sufi poets have produced works in this genre. This article attempts to briefly define munajat and the form of munajatnameh, as well as to point out its place in classical literature, and also to introduce the Munacatnameh of Mela Ehmedê Heyderî to the world of science. Our research reveals that there is no munacatnameh that has yet been identified and introduced in the field of classical Kurdish literature in Türkiye. Therefore, this article claims to be the first step towards filling the gap. Unless a previous munajatnameh is identified, Mela Ehmedê Heyderî's Munajatnameh is the first independent munajatnamehs in the Kurmanji Kurdish. The aforementioned munajatnameh was described and analyzed point by point as stated in the conclusion of the article.

Keywords: The classical Kurdish literature, munajat, munajatnameh, The Munajatnameh of Mela Ehmedê Heyderî

Klasik Edebiyatta Münacatname ve Mela Ehmedê Heyderî Münacatnamesi**Öz**

Münacat, dua ve yakarış anlamına gelir; edebi bir kavram olarak münacat, dua ve yakarış yoluyla Tanrı'dan bağışlanma ve yardım dilemeyi içeren şiiirdir. Klasik edebiyatta münacat, hem eserlerin girizgahlarının bir parçası olarak hem de bağımsız bir eser olarak yazılır. Şayet bağımsız bir eser olarak kaleme alınmış ise münacatname adını alır. Münacatnameler de genellikle mesnevi biçiminde yazılır ve tür açısından dinî mesneviler olarak kabul edilir. Klasik Doğu edebiyatında ve klasik Kürt edebiyatında birçok mutasavvıf şair bu türde eserler vermiştir. Bu makale, münacat ve münacatname nazım biçimini kısaca tanımlamayı, klasik edebiyattaki yerini belirtmeyi ve ayrıca Mela Ehmedê Heyderî'nin münacatnamesini bilim dünyasına tanıtmayı amaçlamaktadır. Çünkü araştırmamız itibarıyla Türkiye'de klasik Kürt edebiyatı alanında henüz

tespit edilip tanıtılmış bir münacatname bulunmamaktadır. Bu nedenle bu makale, bu boşluğu doldurmaya yönelik ilk adım olduğunu iddia etmektedir. Bundan daha eski bir münacatname tespit edilmediği sürece, Mela Ehmedê Heyderî'nin Münacatnamesi Kürtçe'nin Kurmanci lehçesinin ilk münacatnamesidir. Ayrıca, bu çalışmada söz konusu münacatnamenin tavsifi ile tahlili yapılmış ve tespit edilen noktalar sonuç bölümünde belirtilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt edebiyatı, münacat, münacatname, Mela Ehmedê Heyderî Münacatnamesi

Destpêk

Munacat di zimanê Erebi da ji rîşeya “necw”ê darijiye û tê wateya “kurtepestîn”ê. Bi maneya ferhengî, munacat herwesa wê yekê jî îfade dike ku mirov li ber guhê hev bi kurtepestî razekê eşkere bike (Macit, 2020, r. 562). Wek tîgiheke edebiyatê jî munacat, ew cure helbest e ku ji bo gazî, hawar, lava û diayên ji Xwedê, hema hema bi hemû teşeyên nezmê yên wekî xezel, qesîde, mesnewî, rûbaî, murabba, museddes, tercîe bend, terkîbê bend û hwd. tên nivîsîn (Koçin, 2011, r. 19). Dîsa munacatên mensûr û îlahiyên mutesewif û derwêşan jî dikevin vê çarçoveyê. Li gorî Macit ji xeynî van, di muzîka dînî ya Tirkî da ji wan menzûmeyan ra yên ku di mijara navborî da hatine nivîsîn, munacat tê gotin ku di meha remezanê da berî banga sibehê ji mînareyê digel temcîdan tên xwendin (Macit, 2020, r. 562). Munacatên menzûn herweha bi formeke taybet a muzîka dînî va tên bestekirin da ku di merasimên dînî da bên gotin (Pala, 2005, r. 340).

Di nerîta Îslamî ya berhemnivîsînê da nivîskar an jî şair bi besmele, hemdele û selweleyê va dest bi berhemên xwe dikan. Anku bi zikirkirina navê Xwedê, bi şukr û spasiya ji bo Xwedê û herweha bi selawatên li ser pêxember va dest pê dikan. Ev beşên navborî yên berhemên pexşan in. Lê di berhemên menzûm da ev beş dibin “tewhîd”, “munacat” û “ne’î” (Adak, 2015, r. 416-417). Di beşa tewhîdê da şair li ser hebûn û yekbûna Xwedê radiwestin û bi ravekirina nav û rengdêrên wî va balê dikişînin ku takehebûna rastîn, hebûna Xwedê ye. Heçî beşa munacatê ye, şair ecz û feqra xwe tînin ziman û ji ber guneh û emelên xwe yên xirab, hêviya bexşandina Xwedê dikan. Lê em dibînin ku di hin berheman da şair tînin, tewhîd û munacatê pêkva wekî beşekê jî tertîb dikan û dinivîsin. Bo nimûne, munacata di destpêka Kutadgu Bîlîgê da û ya di destpêka berhema Sekkakî da xusûsiyetên tewhîdê jî di xwe da vedihewînin (Koçin, 2011, r. 32-

34). Nexwe şair pêşiyê yekbûn û mezinbûna Xwedê destnîşan dîkin û dû ra jî bi şukr û spasî ecz û feqriyeta xwe tînin ziman (Levend, 1973, r. 37). Şair bi vî awayî hem yekîtiya Xwedê îfade dike û hem jî dibe şikirdarê Xwedayê ku afirînerê wî û hemû dinyayê ye.

Di edebiyata klasîk a rojhilatê da di warê nivîsîna munacatê da em rastî du rêbazan tên. Yek jê, emilandina munacatê wekî beşeke destpêkê ya berhemê; ya duyê jî nivîsîna munacatê wekî berhemeke serbixwe ye. Li gorî rêbaza yekem, şair gava dîwanekê tertîb dike yan jî mesnewiyekê dinivîse, berî derbasî mijara xwe ya esasî bibe, di binbeşên destpêkê da cih dide munacatê. Heger ev dîwanek be, ev munacat bêtir di forma qesîdeyekê da derdikeve pêşiya me; lêbelê heger mesnewiyek be, wekî beşeke destpêkê organîze dibe. Li gorî rêbaza duyem jî ev cure berhem dibe ku pexşan be, dibe ku menzûn be. Lê di nerîta edebiyata klasîk da forma menzûm bêtir tê tercîhkirin (Zebârî û Babayîgît, 2022a; Zebârî û Babayîgît, 2022b). Herweha ji wan munacatan ra yên ku wekî berhemeke serbixwe tên nivîsîn, di lîteraturê da munacatname tê gotin. Dîsa ji bo vî cureyê ji xeynî munacatnameyê, bêjeya tezerrûnameyê jî tê bikaranîn (Koçîn, 2011, r. 20). Munacatnameyên menzûm bi terciha giştî, di forma mesnewiyê da tên nivîsîn. Nexwe wekî kategorî munacatname dikevin bin sîwana mesnewiyên dînî (Adak, 2019, r. 329).

Di rastiya xwe da munacat ew cure helbest in ku şair tê da hestên xwe yên gunehkarî û poşmaniyê tînin ziman, xeletî û gunehên xwe bi eşkereyî îfade dîkin û herweha hêviya bexşandinê ji Xwedê dîkin. Ji lewma jî munacatname ji hêla ziman û uslûbê va li gorî cureyên din ên edebî, bêtir bi şêwezarekî vekirî tên nivîsîn (Îsen û yên din, 2006, r. 258). Herweha di munacatnameyan da ji ber ku şair rasterast berê xwe didin Xwedê û jê hêvî û diayan dîkin, êdî guh nadin hesasiyet û endîşeya edebîbûnê û lewma jî di van berheman da hestên şair xwe didin dest.

Ev gotar hewl dide ku bi kurtî li ser munacatê raweste ku cureyeke edebiyata klasîk e û herweha Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî bide nasandin û tewsîf û tehlîla wê bike ku li qada Tirkîyeyê yekem munacatnameya bi Kurdî ye ku bi rêbaza îlmî tê vekolan û weşandin. Ev gotar ji destpêkek, du beşan û encamekê pêk tê. Di destpêkê da em li ser têgiha munacatê û pênaseyên wê rawestiyân. Di beşa yekem da jî me şêweya bikaranîna munacatê di edebiyata klasîk da destnîşan kir û herweha em li ser ferqa munacatên di girîzgehên berheman da û munacatnameyên

serbixwe rawestiyan. Di beşa duyem da em li ser Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî rawestiyan. Di vê beşê da herweha heta ji destê me hat, me hem tewsîf û hem jî tehlîla munacatnameyê kir. Di beşa sêyem da jî me bi rêbaza îlmî va metnê bitenkîd ê munacatnameyê amade kir. Dîsa di encamê da jî me amaje bi xalên ku di vê gotarê da hatin tesbîtkirin, kir.

Metna munacatnameya di vê gotarê da bi berawirdkirina nusxeya muelif û nusxeya Seyîd Remezan va û herweha bi emilandina alfabeya transkrîpsiyona navneteweyî va hat amadekirin. Sembolên ku ji bo herfên alfabeya Erebi da hene, lêbelê di alfabeya Kurdî da tunene li jêr hatine destnîşankirin:

Elifbêya Transkrîpsiyonê

ء	: ’
ث	: Şş
ح	: Hh
ذ	: Zz
ص	: Şş
ض	: Żż
ط	: Tt
ظ	: Zz
ع	: ‘
غ	: Xx

1. Munacatname di edebiyata klasîk da

Di seyra wê ya tarixî da mirov dikare dîroka munacatê bigihîne, insan û pêxemberê ewil Hz. Adem. Lewra bi qasî ku di ayeta 23yem a Sûreyê E’rafê da tê ragihandin², gava Hz. Adem û Hz. Hewa bi şeytan tîn xapandin û bi dû ra jî ji cinetê tîn avêtin, dia û lavayê ji Xwedê dikin ku wan bibexşîne û ev jî wekî yekem munacat tê qebûlkin (Koçin, 2011, r. 20). Dîsa di Qur’anê da gelek nimûneyên dia û munacatên pêxemberên din jî hene.

Lêbelê di edebiyata klasîk da wekî teşeyê serbixwe, munacat pêşiyê di edebiyata Erebi da derketiye holê û bi dû ra jî wir derbasî nav edebiyatên gelên din ên wekî Faris, Tirk û Kurdan

² “(Adem û Hewwa) Gotin: Xwedayê me! Me neheqî li xwe kir, eger Tu li me neborî û rehme li me nekî, tegez em ê bibin ji yê xesaretkirî.” (Ayeta 23yem a Sûreyê E’rafê, wergera bi kurdî Hüseyin Gündüz û Mehmet Seyhan, Weşanên Serokatîya Karûbarên Dîyanetê).

bûye. Bi qasî ku Koçin diyar dike, hê di hîna çar xelîfeyan da berhemên bi dirûvên munacatê hatine dayîn û ew nimûneyên munacatê hene ku bi bal van her çar xelîfeyên ewil va tîn îsnadkirin (Koçin, 2011, r. 22). Herweha ji munacatên ewil yek bi bal Zeynelabidînê kurê Hz. Huseyînê neviyê pêxember, yeke din jî bi bal Îbrahîm bin Edhemê Belxî tîn îsnadkirin (Koçin, 2011, r. 24).

Di edebiyata Farisî da nûnerên qelemxurt ên ku munacat nivîsîne kesên wekî Xoce Ebdullah Ensarî (m. 1089), Nîzamiyê Gencewî (m. 1204), Ferîduddînê Ettar (m. 1230), Mewlana (m. 1273) û Camî (m. 1492) ne (Koçin, 2011, 26-27). Ev kesên navborî û şair û nivîskarên din ên ku di van serdeman da bi Farisî nivîsîne, tesîreke mezin hem li edebiyata Tirkî û herweha hem jî li edebiyata Kurdî kirine.

Tirk jî piştî ku bûne Misilman, edebiyata wan jî ketiye bin tesîra edebiyata Îslamî. Cureyên edebiyata klasîk bi rêya edebiyata Farisî derbasî edebiyata Tirkî jî bûne. Di vê serdemê da yekem berhema edebî ya ku bi Tirkî hatiye nivîsîn, Kutadgu Bîlîga Yusuf Has Hacîb e. Ev berhem jî li gorî tradîsyona edebiyata klasîk bi munacatê va dest pê dike (Koçin, 2011, r. 32). Piştî Yusuf Has Hacîb şairên Tirk, munacat yan wekî beşeke berhemê yan jî wekî berhemeke serbixwe nivîsîne. Ji şairên destpêkê yê edebiyata Tirkî, di Dîwana Hikmetê ya Xoce Ehmed Yesewî da jî munacatek heye (Koçin, 2011, r. 33). Dîsa Sekkakiyê ku wekî yekem şairê mezin ê Tirkîya Çaxatayî tê qebûlkirin jî munacatek nivîsiye û ev cure, bi şûn da bi qelema Elîşêr Newayî xurtir bûye (Koçin, 2011, r. 34-35).

Heçî edebiyata klasîk a Kurdî ye, ew jî di bin tesîra unsûrên Îslamî û Îranî da geş bûye û şax vedaye. Şair û nivîskarên kurd jî di destpêka berhemên xwe yê curbicur da wekî beşekê cih dane munacatê. Bo nimûne, ji dîwana Feqiyê Teyran helbesta çarem a ku bi risteya “*Xwedawenda gunehkar im*”, helbesta pêncem a bi Farisî ya ku bi rêsteya “*Îlahî ger gunehkar em besî darem peşîmanî*”, helbesta nehem a ku bi risteya “*Îlahî ebduke atak*” û helbesta dehem a ku bi risteya “*Xwedawenda tu sebbûh î*” va dest pê dîkin (Teyran, 2022, r. 62-65/86-91), di forma munacatê da hatine nivîsîn. Dîsa Ehmedê Xanî jî beşa duyem a Mem û Zîna xwe wekî munacatê tertîb kiriye (Xanî, 2010, r. 131-138). Ji diyalektên din ên Kurdî jî em dikarin herdu munacatnameyên Elmas Xanê Kendûleyî (Gezer, 2023, r. 21-22) wekî nimûne destnîşan bikin. Lêbelê li gorî

lêkolîna ku me kir, bi Kurdî qet nebe li qada Tirkîyeyê, munacatnameyeke serbixwe nehatiye tesbîtkirin û di lîteraturê da nehatiye qeydkirin. Ji lewma jî Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî ya ku em ê di beşa duyem a vê gotarê da bidin nasandin û li ser rawestin, yekem munacatnameya bi Kurdiya Kurmancî ye ku dê bikeve lîteraturê. Helbet ev nayê wê wateyê ku munacatnameyên bi Kurmancî berî Heyderî tunene. Lê ev munacatnameyên ku divê hebin, pêwîst e bi vekolîna vekoleran bîn keşfêkirin û weşandin.

1. Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî

Mela Ehmedê Heyderî di serlewheyê vê berhema xwe da navê *Munacata Ehmed Heyderî* bi kar aniye. Ev munacatnameya Heyderî, berhemeke menzûm e û bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Jixwe Heyderî di dawîya munacatê da teşeya nezmê ya vê berhemê bi xwe wiha diyar kiriye:

Felîllahî hemd û şena bêqiyas
Bi xeyr û şefa meşnewî bû xilas

2.1. Tewsîfa Nusxeyê

Du nusxeyên munacatnameya Heyderî li ber dest hene. Yek jê nusxeya muelif e û ya duyê jî Nusxeya Seyîd Remezan e. Nusxeya resen a muelif vê gavê li cem malbata Heyderî parastî ye. Xetên nusxeya muelif bi hereke ne û lewma xwendina wê hêsan e. Nusxeya muelif herweha bi hîbra reş hatiye nivîsîn, ji panzdeh rûpelan pêk tê û di her rûpelekê da jî deh malik hene. Nusxe bi tevahî ji 140 beytan pêk tê. Herweha Munacat bi behra muteqarib a nesalim “fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûl” hatiye nivîsîn. Wekî li jor jî hat diyarkirin, teşeya munacatnameyê mesnewî ye, anku berhem bi malikan hatiye nivîsîn û her malikek jî di nav xwe da hemserwa ye. Herwesa di dawîya munacatnameyê da tarîxa nivîsîna wê jî ji hêla muelif va hatiye diyarkirin ku wiha ye: “*Temmet bi ‘ewni’l-melîki’l-‘ellam 27 Hezîran 1250³ sene-î rûmî ‘Ela yedî mu’ellif Ehmed Heyderî.*”⁴ Dema em vê dîroka rûmî diqulibînin mîladî, dibe 27ê Hezîrana 1934an. Heyderî di munacatnameya xwe da mexles jî bi kar aniye. Mexlesa di vir da wekî ya di dîwana wî da (Heyderî, 2020, r. 39) *Heyderî Ehmed* e û di malika sed û sih û yekê da derbas dibe.

Heçî nusxeya Seyîd Remezan e, ew jî di sala 1948an da li ber nusxeya resen a muelif hatiye îstinsaxkirin (Heyderî, 2022, r. 61).

³ Di vir da divê em wê yekê destnîşan bikin ku ev dîroka rûmî bi xeletî wekî 1250 hatiye nivîsîn. Lewra sala bûyîn û wefata Mela Ehmedê Heyderî diyar e, ji ber vê çendê jî ev sal ne 1250, lê divê 1350 be.

⁴ Bi alîkariya Xwedayê pir zana xilas bû di 27ê Hezîrana 1250yî rûmî da li ser destê muelif Ehmed Heyderî.

2.2. Tehlîla Nusxeyê

Mela Ehmedê Heyderî li gorî kevneşopiya klasîk tevgeriyaye û di destpêka berhema xwe da cih daye beşên wekî besmele, hemdele û tewhîdê. Anku Heyderî bi besmele û hemdeleyê va dest bi berhema xwe kiriye û dû ra derbasî beşa tewhîdê bûye. Di beşa tewhîdê da Heyderî adeta hemû xalên ku di Sûreyê Îxlasê da hene (bnr. Sûreyê Îxlas, 112/1-4), yek bi yek rêz kirine.

Dizanim tunînin ji bil te xuda
Hukumdarê tenha di milkê xuda

Dizanim te nînin tu bab û weled
Tu da û tu hinkûf tu yî her ehed

Dizanim te nînin şîrîk û heval
Bi dil min yeqîn e te nîne zewal

Dizanim tunîne bidayet li te
Ne mişl û şebîh ne nihayet li te

Li gorî dînê Îslamê, gunehên mirov çî qas zehf be jî divê mirov hêviya xwe ji rehmeta Xwedê nebire û timî ji wî hêviya bexşandinê bike. Lewra Xwedê di vê babetê da di Qur'anê da wiha ferman dike, “Ji wan ra bêje, gelî evdên min ên ku li dijî xwe di gunehan da ji hedê xwe derbas bûne! Hêviya xwe ji rehmeta Xwedê nebirin. Xwedê (ku bixwaze) hemû gunehan dibexşîne, ya rast ew gelekî bexşende û mîhreban e” (Zumer, 39/53). Ji ber vê çendê jî di munacatên xwe da şair berê xwe didin Xwedê û jê hêvî û daxwaza efû û mexfîreta wî dikin. Di vê çarçoveyê da gava em li munacata Heyderî dinihêrin, em dibînin ku ew jî balê dikişîne ku wî di jiyana xwe da gelekî xeletî û guneh kirine. Hetta di vî warî da bêjeya *me'siyetê* bi kar tîne ku hemrîşeyê bêjeya *îsyane* ye (Topaloğlu, 2003, r. 77). Anku Heyderî diyar dike ku wî bi gotina Xwedê nekir, wî îsyane kir û bû ji gunehkar û muflisan. Lê Heyderî dîsa jî hêviya xwe ji rehmeta Xwedê qut nake û herweha gazî û hawarê ji Xwedê dike ku bi rehmeta xwe ya dewlemend û bêsînor va wî efû bike. Heyderî herwesa poşmaniya xwe ya ji ber guneh û efalên xirab tîne ziman û ji Xwedê ra dibêje ku “Tu yî tewwab û settaru'l-uyûb” anku *tu yî yê tobeyan pir qebûl dike û eyban vedişêre* û bi vî awayî ji Xwedê hêviya qebûlkirina tobeyên xwe û bexşandina eyb û gunehên xwe dike. Nexwe di vir da em dibînin ku Heyderî, navê Xwedê *tewwab* dike wesîle ku tobeya wî were qebûlkirin. Lewra

tewwab ji ji esmaê husnayê ye û heger nisbet bi Xwedê were kirin, wê demê tê maneya yê ku tobeyan pir qebûl dike (Topaloğlu, 2012, r. 48).

Ez im muflis û mufsid û pir xeşa
Tu yî dewlemend û we wafir ‘eşa

Ez im ê mudamê di me‘şiyetê
Tu yî şahibê cûd û mexfiretê

Ez im ê xirab û di ef‘alê bed
Tu yî hadî yû destegîr û şemed

Poşîmanim tewbe ji cem‘ê zunûb
Tu yî her tewwab û settar‘il-‘uyûb

Di gelek cihên Qur‘anê da (Alî Îmran, 3/175; Maîde, 5/28; En‘am, 6/15; Hûd, 11/103; Îbrahîm, 14/14; Rehman, 55/46) Xwedê însanan hişyar dike ku ji ezabê wî bitirsin, lê ev tirs nayê wê maneyê ku divê însan bêhêvî bibin, bereksê wê divê însan ji rehmeta Xwedê umîdwar bin ku ev yek dîsa di Qur‘anê da wiha tê diyarkirin, “Ji rehmeta Xwedê hêvîdar in, ji ezabê wî bi tirs in” (Îsra, 17/57). Ev mijara tirs û hêviyê di tesewifê da wekî rêgeza *xewf û recayê* hatiye formulekirin ku li gorî vê, divê dilê mirov timî di navbera *xewf û recayê* da be. Anku mirov dê hem ji ezabê Xwedê bitirse û hem jî ji rehmeta wî bi hêvî be (Uludağ, 2016, r. 292). Mela Ehmedê Heyderî ku ji hêla tesewifê va muntisibê Şêx Ehmedê Xiznewî ye (Heyderî, 2022, r. 59) û hay ji rê û rêzikên tesewifê heye, em dibînin ku di munacata xwe da ev *rêgeza xewf û recayê* cîbicî kiriye. Em dibînin ku Heyderî jî timî di nav vê *xewf û recayê* da ye. Lewra Heyderî diyar dike ku tirs wî heye ku ji ber deriyê alî (cenet) were qewirandin. Anku îlm û zanîn û herweha taet û îbadet ji bo mirov deriyê felatê venakin, heger lutf û rehmeta Xwedê nebe.

Îlahî ji bil te tu kes min nehin
Feqîr û heqîr im tu yî rebbê min

Îlahî telebdarê lutfê te me
Şev û ro bi ahîn û nalende me

Îlahî li min ger nekî minnetê
Ji xeyrî te ka şahibê rehma

Îlahî digel min bi lûfta xwe kî

Ji ber babê alî min merdûd nekî

Di munacata Heyderî da dîsa em dibînin ku haya wî bi meseleyên kelam û felsefeyê heye û di vê mijarê da li ser rêbaza tesewifê ye. Lewra Heyderî wekî qedîm, ezeli û ebedî hebûna Xwedê qebûl dike û yê mayîn jî wekî *heyberên bi şûn da hatine afîrandin* dibîne. Lewra Heyderî diyar dike ku Xwedê însan û cin jî tunebûnê afiradine ku li gorî tesewifê ev yek di *mertebe ya alema cismanî û mertebeya însanê kamil* da pêk tê (Îbnî Erebi, 2017, r. 11).

Dizanim tu heyî î te nîne mirin

Te anîn ji ketma ‘edem ins û cin

Dizanim dizanî bi sirra şudûr

Li zatê te nîne tu ‘eyb û qusûr

Şair di munacatan da bi gelemperî berê xwe didin navên Xwedê yê ku wekî *esmayê husna* tên binavkirin da ku diayên wan bên qebûlkirin (Ay, 2024, r. 1051). Heyderî jî di munacata xwe da bi navên Xwedê yê wekî *Heyy, Wahid, Hadî, Samed, Şafî, Tewwab* va hêviya bexşandinê ji Xwedê dike. Ji xeynî van, Heyderî hetta bi xwe gazî Xwedê dike ku wî bide xatirê hezar û yek navê xwe û wî efû bike.

Îlahî min cem‘ê umûrê di xwe

Bi qelbekî şafî sipartîye te

Bi qedrê hezar û yek navê xwe kî

Min muhtacê destê nêmerdan nekî

Di munacatan da dîsa şair, kesayetên dînî û dîrokî ji xwe ra dîkin wesîle û pê gazî û hewara xwe digihînin Xwedê. Em dibînin ku Heyderî jî di munacata xwe da gazî Xwedê dike ku ji bo xatirê dinya û kaînatê, milyaketan, pêxemberan, cihên pîroz, mirovên ehlê Xwedê, evîndarên bêmiraz, rêveberên adil û pêşeng û pêgirtiyên navdar ên tesewifê, wî efû bike. Em dikarin nimûneyên vê xalê wiha rêz bikin: Hz. Mihemed û Hz. Adem di serî da *hemû pêxember, malbat û sehabeyên pêxember; çar xelîfe; îmamê çar mezheban*; Cebraîl, Mîkaîl, Îsrafil û Ezraîl di serî da *hemû milyaket; herçar kitêbên pîroz* Tewrat, Zebûr, Încîl, Qur‘an; *mekanên dînî yê pîroz* Beytul Muqedes, Beytul Heram, Mekke, Medîne, Tûrê Sîna; *rojên pîroz* eyd û newroz; *sehabeyên şair û şervan* Miqdad bin Eswed (m. 653), Emr bin Me‘dikereb (şair e, m. 641-42), Derrar bin Ezwer

(şair e, m. 634), Ce'fer bin Ebû Talib (m. 629) û herweha Bîlalê Hebeş; *kesayetên jin* Hewa, Hacer, Sara, Keça Gurcî; *cih û kesayetên mîtolojîk û efsanewî* Kûhê Qaf, Camasb, Ristemê Zal, Seyîd Betal, Şêxê Sen'an; *lehengên destanên evînî* Ferhad û Şîrîn, Leyl û Mecnûn, Mem û Zîn, Seyfil Mulûk; *feylesof* Eflatûn, Calinus (m. 200 ?); *xelîfe û wezîr* Harûn Reşîd (m. 809), Se'dul Milûk (wezîrê Selçûqîyan, m. 1107); *mitesewîf* Weysel Qerenî (m. 657), Merûfê Kerxî (m. 815-16 ?), Zennûnê Misrî (m. 859 ?), Ebdulxaliq Xicdewanî (m. 1179 an jî 1220), Şemsê Tebrîzî (m. 1247 ?), Seyîd Emîr Kulal (m. 1370), Bahaedîn Neqşibend (m. 1389), Ebdulkerîm Cîlî (m. 1428), Ehmed el-Farûqî (Îmam Rebbanî, m. 1624), Ebdullah ed-Dehlewî (m. 1824); *şair û mitesewîfên Kurd* Melayê Cizîrî (m. 1640), Ehmedê Xanî (m. 1707), Seyîd Taha (m. 1853), Seyîd Sibxetullah (m. 1870), Şêx Celadîn (m. 1878), Seyîd Nûr Mihemed, Seyîd Elî (m. 1914), Şêx Mihemed Şîrîn (m. 1914), Şêx Şehabedîn (m. 1914), Xelîfe Selîm (Mele Selîm, m. 1914), Seyda (Şêx Ebdurehmanê Taxî, m. 1886), Ziya (Şêx Mihemed Ziyaedîn, m. 1924), Şêx Fethî (m. 1899), Şêx Ehmedê Xiznewî (m. 1950).

Bibîranîna kesayetên dînî û dîrokî di munacatan da wekî me li jor jî diyar kir, ji bo edebiyata klasîk bûye tradîsyonekê û Heyderî jî li gorî vê tradîsyonê di vê beşê da cih daye gelek kesayetên dînî û dîrokî. Lêbelê ji bo vê beşê em dikarin wê yekê bêjin ku Heyderî ji şairên klasîk cudatir hin nav derxistine pêş ku ev jî nîşanê me dide ku ev kes ji bo wî giring in. Di vê beşê da em dibînin ku Heyderî sehabeyên şair ên wekî Emr bin Me'dîkereb û Derrar bin Ezwer bi taybetî bi bîr anîne ku ev jî nîşaneyê wê yekê ye ku şair ji bo wî bi qîmet in. Dîsa Heyderî di munacata xwe da *newroz* jî wekî heyameke pîroz derxistiye pêş. Heyderî di vê beşê da helbet cihekî berfireh daye nûnerên ekolên tesewîfê û herweha qutb û murşîdên mezin jî. Lê li rex van kesayetên dînî em dibînin ku Heyderî, alimên ku ji ber Serhildana Bidlîsê hatine dardakirin (Demirtaş, 2018, r. 453) jî baxusûs bi bîr anîne ku ew jî Seyîd Elî, Şêx Mihemed Şîrîn, Şêx Şehabedîn û Xelîf Selîm in.

Dîsa em dibînin ku Heyderî ev munacata xwe ne bi tenê ji bo şexsê xwe, herweha ji bo civakê bi tevahî nivîsiye û ji Xwedê jî hêvî dike ku kê vê diayê bixwîne yan jî li ser kê were xwendin, hem ji bo canê wan û hem jî ji bo ruhê wan bibe wesîleya şîfa û efûkirina gunehan.

Kesê bête xwendin li wî ev du'a

Îlahî şîfa kî ji derd û bela

Heçî ku bixûne bi qedrek mezin

‘Efû kî ji zenb û webalan ji bin

Heyderî herî dawî ji Xwedê dixwaze ku wî bi îman ji dunyayê derxe, jêpîrsîna di merzel da hêsan bike, roja hesabê, wî şermî neke û herweha hemû Misilmanan efû bike.

Bi îman me derxî ji dunya xedar

Li ser min sehil kî su’ala mezar

Di weqtê hesabê me şermî nekî

Gunah û xeşa’ê di min berze kî

‘Efû kî bi şadî heçî Musliman

Li ser me muselleş nekî zaliman

Ji aliyekî din va divê em li vir bal bikişînin ser wê yekê ku wekî tesîra edebî, Heyderî jî daye ser şopa Ehmedê Xanî û Mela Xelîlê Sêrtî. Lewra wekî me li gor jî amaje pê kir, munacata Heyderî bi qalibê “fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûl” ê kêşa erûzê va hatiye nivîsîn ku ev qalib, yê mesnewiyê dînî yên bi Kurdî ye. Lewra emilandina vî qalibî di edebiyata klasîk a Kurdî da bi mewlûdnameya Ehmedê Xanî va dest pê kiriye û bi dû ra bi Nehcu’l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî û Rewdu’n-Ne’îma Şêx Ehmedê Axtepî va dewam kiriye (Adak, 2019, r. 263-264).

2.3. Metnê bi tenkîd ê Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî

Munacata Ehmed Heyderî

Bismillahî Rehmanî Rehîm

Îlahî çî hemd û şena’ê dibin

1. Bi carek ji bona cenabê te bin

Îlahî tu rebb û xudanê me yî

Xebîrê bi sirr û ‘eyanê me yî

Tu yî rebbê cennet tu yî rebbê nar

Tu yî rebbê ‘erz û sema û bihar

Tu yî rebbê şems û tu yî rebbê mah

Tu yî rebbê emlak tu yî rebbê cah

Tu yî rebbê kursî tu yî rebbê ‘erş

Tu yî rebbê lewî û tu yî rebbê ferş

Tu yî rebbê ilm û kitab û qelem

Tu yî rebbê mecmû‘ê ceyş û ‘elem

Tu yî rebbî’l-erbab we rebbî’l-mulûk

Tu yî rebbê tiştê kebîr û biçûk

Tu yî rebbê mar û tu yî rebbê mûr

Tu yî rebbê hindî birûc û quşûr

Tu yî rebbê av û tu yî rebbê xak

Tu yî rebbê cinn û wuhûş û simak

Tu yî rebbê milk û tu yî rebbê mal

10. Tu yî rebbê hindî nisa’ û rical

Tu yî rebbê şexşê bi qelbê selîm

Tu yî rebbê van ê xirab û le’îm

Dizanim te nînin tu bab û weled

Tu da û tu hinkûf tu yî her *eħed*⁵

Dizanim tunînin ji bil te xuda

Ĥukumdarê تنها di milkê xwe da

⁵ Di nusxeya Seyîd Remezan da “ebed” derbas dibe.

Dizanim te nînin şîrîk û heval
Bi dil min yeqîn e te nîne zewal

Dizanim tunîne bidayet li te
Ne mişl û şebîh ne nihayet li te

Dizanim heçî xa'ib û hâzîr in
Bila şek dibînî hemî zahir in

Dizanim neborîn li te sal û mah
Ne weqt û zeman waḥîd î bêpenah

Dizanim tu heyy î te nîne mirin
Te anîn ji *ketma* 'edem⁶ ins û cin

Dizanim dizanî bi sirra şudûr
Li zatê te nîne tu 'eyb û qusûr

Îlahî ji bil te tu kes min *nehin*⁷
20. Feqîr û heqîr im tu yî rebbê min

Îlahî telebdarê lûṭfa te me
Şev û ro bi ahîn û nalende me

Îlahî bi min de dewa'ê dil'im
We ger ne telef bû dilê pir elem

⁶ Di nusxeya muelif da "ketm û 'edem" derbas dibe.

⁷ Di nusxeya muelif da "nihin" derbas dibe.

Îlahî ji behra kerem qetrekî
Li min sa'ilê bê newa werbikî

Îlahî li min ger nekî minnetê
Ji xeyrî te ka şahibê rehetê

Îlahî digel min bi lûfta xwe kî
Ji ber babê alî *min*⁸ merdûd nekî

Îlahî dewakî dilê daxîdar
Fewellahi luqman *nehin*⁹ pê tu car

Ez im şahibê cerg û qelbê kebîb
Ji xeyrî cenabê te nînin tîbîb

Ez im muflis û mufsid û pir xeşa
Tu yî dewlemend û we wafir 'eşa

Ez im ey mudamê di me'şiyetê
Tu yî şahibê cûd û mexfiretê

Ez im ê xerîb û bila xaniman
30. Tu yî ê xudanê melek ins û can

Ez im ê perîşan û mehzûn û jar
Tu yî malikê mirweta bêşumar

Ez im ê xirab û di ef'alê bed

⁸ Di nusxeya Seyîd Remezan da "me" derbas dibe.

⁹ Di nusxeya muelif da "nihin" derbas dibe.

Tu yî hadî yû destegîr û şemed

Ez im ê merîz û hilakê ‘ecîb

Tu yî ya ilahî hekîm û hebîb

Ez im ê birîndar û dilxeste ye

Tu yî ê ku derman li nik te heye

Ez im ê xerîqê di behrê nihan

Tu yî ê nihanî li ber te ‘eyan

Ez im ê ji ax û ji ava mehîn

Tu yî ê te çêkir sema’ û zemîn

Ez im ê ku muhtac di sal û mehan

Tu yî wafir ikram we şahê shehan

Ez im ê ser û pa bi eş û elem

Tu yî şafiyê heq tu yî zu’l-kerem

Ez im ê bi ta û ez im ¹⁰ bi ba

Tu yî muhriban û tu yî her şifa

Ez im ê di qeydê bi pa û bi zend

40. Tu yî ê bi girtin bi berdan û bend

Ez im ê mudamê di fi’lê heram

Tu yî ê dibexşî bi carek temam

¹⁰ Di nusxeya muelîf da “ê” hatiye jibîrkirin.

Ji cem‘ê *xela’iq*¹¹ ez im ê bexîl

Fuzûl û nemam û qebîl û rezîl

Diborin eyam’im di fi‘lê nehî

Li nik min heye yek tu pê ageh î

Kelîmê şhadet çî şehdê şîrîn

Demadem dibêjim bi şîdîq û yeqîn

Di agir kevim ger di behrê nihan

Yeqîn dê bibêjim nihan û ‘eyan

Poşîmanim tewbe ji cem‘ê zunûb

Tu yî her tewwab û settar’il-‘uyûb

Me ‘ehd e tu caran ku ‘evde nebim

Di halê heyatê di ‘ehda xwe bim

Bi heqqê xwe kî xaliqê zu’l-celal

We ya rebbê ‘alem şehê bêmişal

Bi heqqê Muḥemmed resûlê emîn

Te gotî tu yî eşref’il-alemîn

Bi heqqê temamê ‘eyalê di wî

50. Bi al û şehab û hevalê di wî

Bi Bûbêkrê Şiddîq bi qedrê ‘Umer

Bi ‘Uşman û Kerrar bi Eswed Hecer

¹¹ Di nusxeya muelîf da kîteya dawîn a bêjeya “xela’iq”ê hatiye jibîrkin. Anku wekî “xela” derbas dibe.

Bi heqqê Huseyn hem bi qedrê Hesen
Bi 'Eşr'îl-Mubeşşer bi Weys'îl-Qeren

Îlahî bi wê zemzem û Ke'be'ê
Bi şewm û şelat û digel secde'ê

Bi her çar îmamê *çehar*¹² mezheban
Bi roj û bi heyv û hemî kewkeban

Bi Me'rûfê Kerxî digel 'Emri 'Aş
Bi Eyyûbê Enşar bi merdanê xaş

Bi heqqê ebî Ademê zu'l-kerem
Bi heqqê Hewa mader muhterem

Bi heqqê nebî Yûnis û Hûd û Şîs
Bi heqqê Suleyman we Ye'qûb û 'Îş

Bi Idrîs û Cercîs bi heqqê 'Uzeyr
Bi 'Ebbas û Hemze bi heqqê Zubeyr

Bi Eyyûbê şabir ewî mubtela
Dipîve te xweş kir ji kerb û bela

Bi heqqê Xizir hem bi Ilyas nebî
60. Bi Yehya nebî Yûsif û Şu'lebî

¹² Di nusxeya Seyîd Remezan da "çihar" derbas dibe.

Îlahî bi wî Eşmawîlê resûl
Bi wê incila bû dilê hindî qûl

Bi Zû'l-Kifl û Şaliḥ bi Mûsa'l-Kelîm
Bi 'Îsa bin Meryem ku ḥey kir remîm

Bi ḥurmetê Denyal we ya Camisab
Digel Şemsê Tebrîzî 'alî cenab

Bi heqqê nebî Dawudê zî ḥeya
Di emrê Xudê bû muqîm bê riya

Bi heqqê Şu'eyb û nebî Henzele
Bi Harût û Marût ku şax in hele

Îlahî bi heqqê Birahîm Xelîl
Bi Zennûnê Mişrî bi derya'ê Nîl

Bi heqqê nebî Îsma'îlê zebîḥ
Bi hurmetê Hacer bi Sara melîḥ

Bi ḥurmetê Harûn nebiyê Reşîd
Bi heqqê Zekerya bi Xalid Welîd¹³

Bi heqqê nebî Nûḥ bi Yafes û Sam
Bi heqqê Yese' hem bi ḥurmetê Ḥam

Bi ḥurmetê Qeyna bi heqqê Enûş

70. Bi Lût û digel mu'cizatê di xûş

¹³ Ev beyt di nusxeya muelif da tune, lê bi xetê kesekî din li derkenarê nusxeya muelif hatiye zêdekirin.

Bi heqqê şehîdan digel xaziyan
Îlahî bi zî'l-ħicce û ħaciyan

Bi xocê Herîrî bi şahê tebar
Bi Zerrarê Ezwer bi Ce'fer Teyar

Bi ħurmetê Îşhaq bi qedrê Cuneyd
Bi hecc û zekat û bi nemrûz û 'eyd

Bi ħurmetê Cibrîl digel Mîka'il
Bi heqqê Sirafil digel 'Ezraîl

Bi heqqê ewan ê di bin 'erşê te
Bi rûĥaniyan û hemî neqşê te

Bi heqqê tamamê mela'îketan
Bi wildan û ħûr û bihişt cennetan

Bi heqqê sema' û bi heqqê zemîn
Bi Beytu'l-Muqeddes digel Tûrê Sîn

Bi heqqê cemî'ê nebat û hecer
Bi av û bi ax û bi selc û meţer

Bi şerq û bi xerb û bi hindî felek
Bi narê ku em jê ditirsin gelek

Bi heqqê riyahê di beĥr û berê
80. We ya Selsebîlê digel Kewşerê

Bi hûrmetê kursî bi ‘erşê ‘ezîm
Bi ferş û bi lewh û qelem ya kerîm

Bi heqqê Medînê we Beytu’l-Heram
Bi Mekka Mukerrem we rukn û meqam

Bi heqqê Sikender we qernê şîfaf
Bi hukmê te dayî heta Kûhê Qaf

Bi heqqê Felaţûn tebîbê kerîm
Bi Luqman digel Calînûsê hekîm

Bi heqqê hebîbê Bilalê Hebeş
Bi hûrmetê ‘Ednan bi heqqê Qureys

Bi te‘b û cefa Şeyxê Şen‘aniyan
Bi nûra di wechê keça Gurciyan

Bi heqqê Hesen Eşrefê Beşrewî
Bi hezretê E‘zem şehê Dehlewî

Îlahî bi heqqê şehê Neqşebend
Bi wî Xewşê Cilî hebîbê şemed

Bi heqqê Kulal an Emîrê Seyîd
Bi baba bi xoce bi Ebû’l-Yezîd

Bi Mehmûd û ‘Arif şehanê şerîf
90. Digel Xîcdewanê cenabê leîf

Bi heqqê cenabê Îmamê Huma
Ku Ehmed'îl-Farûqiyê rehnuma

Bi heqqê Sirac kî ew ê rehnumûn
Digel zu'l-cenaheynê nûr'ul-'uyûn

Bi hürmetê Taha me ruswa nekî
Bi qedrê Seyîd Şibxetullahî kî

Bi heqqê Celadîn we Seyyîd Elî
Bi Seyyîd Muḥemmed bila şek welî

Bi heqqê Şîrîn û Xelîfe Selîm
Digel wî Şîhabeddînê *pir*¹⁴ helîm

Bi hürmetê Seyda bi qedrê Ziya
Digel Şêxi Fethî şehê etqiya

Bi heqqê şehê Xiznewî Ehmedî
Digel ehlê beyta ewî emcedî

Bi Seyyîd Birahîm bi Hacı Huseyn
'Elîmanê mahir xelîfanê zeyn

Bi heqqê temamê terîqê di heq
Bi sadatê wan ê bi şewq û şefeq

¹⁴ Di nusxeya muelîf da "pir" hatiye jibîrkin.

Bi hûrmetê salan we cem‘a mehan
100. Bi roj û bi şaman bi subhegehan

Bi ewtad û quṭbê xewaş û sivik
Bi xewş û bi şexşê keramet li nik

Bi hûrmetê Ferhad bi qedrê Şîrîn
Bi Mecnûn û Leylî bi Mem û we Zîn

Bi heqqê Mela‘ê Cizîrî Xuda
Bi Ehmed Efendîyê Xanî nida

Digel qehremanî we Rustemê Zal
Bi Harûn Reşîd kî we Seyyîd Beṭal

Bi hûrmetê Şehbal we Seyf‘il-Mulûk
Bi Miqdadê Eswed we Se‘d‘il-Mulûk

Bi heqqê ‘Umer bin û Me‘dîkereb
Bi Tirk û bi Rûm û bi Kurd û Ereb

Bi Tewrat û bi Încîl bi heqqê Zebûr
Bi hûrmetê Qur‘an kelimê xefûr

Bi şehfê te şandin ji bo enbiyan
Bi ‘edl û bi heqqê ‘elan û ‘eyan

Bi hindî resûlan hemî enbiyan
Bi qencan û qedrê şaliḥ ewliyan

Îlahî bi qedrê hemî ka'inat
110. Di 'erd û di 'ezman heçî mexlûqat

'Efû kî min ê bêkes û rûsiyah
Ji sûc û ji xet û ji cem'ê gunah

Gunahê di min bêhed û bêqiyas
Bi 'efwa min rehma te nabit xilas

Çiqas ins û canê te îcad kirin
Evan ê ku sax in digel ê mirin

Di ber ademê ta bi yewm'il-qiyam
Eger wan 'efû kî xewaş û 'ewam

Ji derya'ê 'efwê çî nuqşan bitin
Bi qasî serê derziyê nabitin

Di weqtê wefa bim bi ismê 'ezîm
Li nik xwe nebînim le'înê recîm

Bi îman me derxî ji dunya xedar
Li ser min sehil kî su'ala mezar

Di weqtê hesabê mi şermî nekî
Gunah û xeşa'ê di min berze kî

Kitabê bidî min bi destê yemîn
Hisabek yesîr tu bi min ra bibîn

Şehînî giran kî ji xeyrê di min
120. Şîratê pehîn kî di ser ra biçîn

Di hâlê heyatê we be‘de‘l-memat
Biçim ez îlahî li ser rahê rast

Çi qa ku xirab û we şermende ne
Belê bi‘l-heqîqet ‘ebîdê te ne

Ji kenza ‘eşa‘ê me bêbehr nekî
Bi heqqê Muḥemmed ḥebîbê xwe kî

Evê eş û jana bi ah û enîn
Ji canê evî hanê xeste derîn

‘Elîl e zelîl e feqîr e bêḥal
Ji ber vê bela‘ê diket nalenal

‘Efû kî ji renc û bela dunyawî
Ji te‘b û cefa zehmeta uxrewî

Kesê bête xwendin li wî ev du‘a
Îlahî şîfa kî ji derd û bela

Heçî ku bixûne bi qedrek mezin
‘Efû kî ji zenb û webalan ji bin

Hilînî cefa‘ û ceza‘ê di me
Derê rehmeta xwe kuşa kî li me

‘Efû kî bi şadî heçî Musliman
130. Li ser me muselleş nekî zaliman

Evî **Heyderîyê** ku **Ehmed** bi nam
Xilas kî ji agir di yewmu’l-qiyam

Di hindî gunahê kebîr û şexîr
Bibexşî bi heqqê beşîr û nezîr

Ji ser ta qedem min ji êş û elem
Temîz û berî kî eya zû’l-hekem

Îlahî merîz im dinalim muqîm
Tu yî her hekîmê kesê bêhekîm

Tu paqij bikî min ji zenga *dine*¹⁵
Di yewmi’l-qiyam ji agir û sohtinê

Îlahî min cem‘ê umûrê di xwe
Bi qelbekî şafî sipartîye te

Bi qedrê hezar û yek navê xwe kî
Min muhtacê destê nemerdan nekî

Qebûl kî rica û du‘a‘ê di min
‘Efû kî cemî‘ê gunahê di min

Bi wî kî xudan qencî yû şaliq e

¹⁵ Di nusxeya Seyîd Remezan da “dunê” derbas dibe.

Bi ʔasîn û ʔaha bi el-fatiʔe

Felillahi ʔemd û ʔena bêqiyas

140. Bi xeyr û ʔefa meʔnewî bû xilaʔ

Temmet bi ‘ewni’l-melîki’l-‘ellam 27 ʔezîran 1250¹⁶ sene-î rûmî ‘Ela yedî mu’ellif
Ehmed Heyderî.

Encam

Munacat wekî têgiheke edebiyata klasîk ew cure helbest e ku ʔair jî bo ku hawar û gaziya xwe bigihînin Xwedê, dinivîsin. Munacat di eslê xwe da hêviya bexşandina Xwedê ye. ʔair bi rêya munacatê va ya ku tê da dia û lavakariyê dîkin, hêvî dîkin ku Xwedê gunehê wan efû bike û bi rehma xwe bi wan ra miemeleyê bike. Di nerîta edebiyata klasîk da gelek ʔairan, nemaze ʔairên mutesewif munacatname nivîsîne. Munacatname bi awayê terciha giştî menzûm in, lêbelê nimûneyên pexşan jî hene. Herweha di lîteraturê da ʔûna bêjeya munacatnameyê carinan tezerrûname jî hatiye bikaranîn.

Di vê gotarê da me ewil munacat bi kurtî pênase kir û cihê wê yê di edebiyata klasîk da destnîşan kir û dû ra jî em li ser Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî rawestiyan. Li gorî lêkolîna me kir, em dikarin çend xalên têkildarî Muncata Heyderî wiha rêz bikin:

1. Berî vê vekolînê, li qada Tirkîyeyê tu munacatnameyeke bi Kurdiya Kurmancî nehatiye testbîtîkirin û bi usûlên îlmî nehatiye weşandin û jî lewma jî ev vekolîn di qada xwe da (ji bo vê gavê) yekemîn e.
2. Ev berhem jî hêla Mela Ehmedê Heyderî di sala 1934an da hatiye nivîsîn û du nusxeyên wê li ber dest hene.
3. Munacata Heyderî wekî form, munacatnameyeke serbixwe ye û bi teşeyê mesnewiyê hatiye nivîsîn. Dîsa her malikeke munacatnameyê di nav xwe da cuda cuda hemserwa ye û munacat bi tevahî sed û çil malik e. Mela Ehmed herwesa di vê berhema xwe da mexlesa *Ehmed Heyderî* emilandiye.

¹⁶ Dubare em li vir jî bal dikişînin ku ev tarîx, ne 1250 lêbelê divê 1350 be ku bi beramberî salnameya mîladî ew jî dibe 1934.

4. Heyderî jî wekî Ehmedê Xanî, Mela Xelîlê Sêrtî û Şêx Ebdurehmanê Axtepî, ev berhema xwe bi qalibê “fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûlun\ fe‘ûl” ê kêşa erûzê va nivîsiye û ev jî nîşan dide ku Heyderî di bin tesîra kesên navborî da ye.
5. Heyderî li gorî tradîsyona klasîk bi besmele, hemdele û tewhîdê va dest bi berhema xwe kiriye û bi şukr û sipasî, yekîtiya Xwedê aniye ziman.
6. Heyderî ji esmayê husna yê Xwedê, navên wekî *Heyy, Wahid, Hadî, Semed, Şaftî û Tewwab* kirine wesîle û pê ji Xwedê hêviya efû û bexşandinê kiriye.
7. Di munacatnameya xwe da Heyderî herwesa cih û mekanên pîroz, kesayetên dînî, kesayetên tarîxî, mutesewifên binavûbang ên her yekî jê mecrayek vekiriye, bi bîr anîne. Di vê xalê da unsûra ku balê dikişîne ser xwe, mirov dikare bêje ku sehabeyên şair in û ev jî nîşan dide ku Heyderî çiqas qîmetê dide helbestê.
8. Heyderî di munacatnameya xwe da ji kesayetên Kurd, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî hêjayî bibîranînê ditiye û herweha ji çanda Kurdî *newroz* jî wekî heyameke pîroz qebûl kiriye.
9. Heyderî ji mutesewif û herweha şêx û meşayîxên Kurd ên berî xwe û yên di serdema xwe da jî bi bîr anîne û nexasim jî di vê xelekê da her çar kesayetên dînî yên ku ji ber *Serhildana Bidlîsê* hatine dardakirin (Seyîd Elî, Şêx Mihemed Şîrîn, Şêx Şehabedîn û Xelîf Selîm), di munacatnameya xwe da li dû hev bi bîr anîne.

Pêşniyaz


Li jor me destnîşan kir ku li qada Tirkîyeyê heta niha tu munacatnameyên bi Kurdî nehatine tesbîtkirin û weşandin. Lê ev nayê wê maneyê ku munacatnameyên bi Kurdî tunene. Ji ber vê çendê jî divê vekolerên edebiyata klasîk a Kurdî berê xwe bidin mijara munacatnameyên bi Kurdî û hewl bidin ku munacatnameyên serbixwe yên bi Kurdî tesbît bikin.

Çavkanî


- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk* (Çapa Sêyem), Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê*. Stenbol: Nûbihar.
- Ay, O. (2024). Bir Münâcât Örneği Olarak Kul Deli Münâcâtı. *Akademik Dil Ve Edebiyat Dergisi*, 8(2), 1044-1063. <https://doi.org/10.34083/akaded.1501921>
- Demirtaş, M. (2018). 1914 Tarihli Bitlis İsyanının Osmanlı Arşiv Belgelerindeki Yansımaları-Cezalar, Mükâfatlar. *Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 7(2), 432-492.

- Gezer, Semih (2023). *Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî (Metin-Lêkolîn)*. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê.
- Heyderî, M. E. (2022). *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn*. (Amadekar: Önder Beyter). Stenbol: Dara.
- İbnî Erebi, Muhyedîn (2017). *Fusûsu'l-Hikem Tercüme ve Şerhi*. (Werger û Şîkar: Ahmed Avni Konuk). İstanbul: Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı.
- İsen, M. (2006). "Türler". *Eski Türk Edebiyatı El Kitabı*. Haz. Mustafa İsen vd. Ankara: Grafiker Yayınları.
- Levend, A. S. (1973). Dinî Edebiyatımızın Başlıca Ürünleri. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı - Belleten*, 20, 35-80.
- Macit, M. (2020). Münâcât, *İslam Ansiklopedisi*, C. 31. İstanbul: DİB Yayınları.
- Meala Qur'ana Pîroz a Kurdî (2015). (Wer: Hüseyin Gündüz, Mehmet Seyhan). Weşanên Serokatîya Karûbarên Dîyanetê.
- Pala, İ. (2005). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, (14. Baskı). İstanbul: Kapı Yayınları.
- Tanrikulu, V., & Babayiğit, M. V. (2021). Common Mythological Legendary and Religious Heroes in the Divans of Serda and Hesbi. *Kadim Hikmet Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi*, 3(5), 22–34.
- Teyran, F. (2022). *Dîwan*. (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım, Çapa 2yem). T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler ve Yayımlar Genel Müdürlüğü Yayınları.
- Topaloğlu, B. (2003). Mâsiyet, *İslam Ansiklopedisi*, C. 28. İstanbul: DİB Yayınları.
- Topaloğlu, B. (2012). Tevvâb, *İslam Ansiklopedisi*, C. 41. İstanbul: DİB Yayınları.
- Uludağ, S. (2016). *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü* (İkinci Baskı). İstanbul: Kabalcı Yayınevi.
- Zebari, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2022). Dîroka rexne ya edebî ya kurdî li rojava (critical history of Kurdish literature in Rojava). *Mezopotamya Disiplinlerarası Çalışmalar Dergisi*, 2(2), 102-109., Doi: 10.29228/mjis.66398.
- Zebari, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2022). Historical analysis of Kurdish literary criticism in the south (Dîroka rexneya edebî ya Kurdî li başûr). *Kadim Hikmet Sosyal Bilimler Dergisi*, 3(6), 28-44.
- Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn*. (Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Kadri Yıldırım). İstanbul: Avesta.

Pêvek



Pêvek 1: Rûpela ewil a nusxeya muelif a Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî.



Pêvek 2: Rûpela dawîn a nusxeya muelif a Munacatnameya Mela Ehmedê Heyderî.